bûyer PRESS
Nûçe Bi ... Zelalî

Gotar û Lêkolîn

Rewşenbîr (Behaneyin Taybet)
Xoşman Qado
Rû.02

Hevpeyvîn

Mihemedê Cemîlê Seyda
Cara Yekem e Ku Hûn Vê Hevpeyvînê Dixwînin
Rû.03

Wêje

Me Ji Hev Re Digot
Hesen Hişyar ( Kurd )
Rû.05

www.buyerpress.com buyerpress buyerpress buyerpress@gmail.com WhatsApp 00905368908545

Rojnameyek Sîyasî - Civakî - Çandî - Serbixwe - Nîvmehane


Hejmar / 07 / 15- 11 - 2014 Buhayî 50 P.S

# 280 Ramyar, Nivîskar, Helbestvan, Romannivîs, Siyasetmedar, û Textor

## Çûn.. Çûn.. Çûn ...

## Erê Ji Amûdê Bûn

Sînema Amûdê
1960 - 2014



Rûpela pêşî ji rojnameya Bûyerpress bi sponseriya
GAZIYA MÎDIYA
Salih Gişti
راعي الصفحة الكردية الأولى صالح كشتي

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpress@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe Bi ... Zelalî

# Tim Serok..Serok..!



Qado Şêrîn

Balkêş e ku tim û tim serokên partiyan li her deverê amade bin.
Nimûne gelek in, her du rêkeftinên Hewlêrê, û li dawî rêkeftina Duhokê wek nimûne. Ta di civînên ENKS de jî tim serokên partiyan amade ne, neku endam in din, rewşenbîr an jî nûner in din ji aliyê partiyan ve amade dibin. Ango partî di kesayetiya serok de qambostî dibin.
Tê çi wateyê?
Bawerî bi endamên din nayê, endamekî din wek serok zana û jîr tune. Serokê partiyê bi tenha dizane guftûgoyan bike, movikên siyasetê verêşe.
Her kes dizane ku yekemîn partî di sala 1957an de li Rojavayê Kurdistanê(R.K) hatiye damezirandin, ana û em di sala 2014an de ne, bêtir ji 33 partiyan hene(me lêkolîn û belav kirye), ev jimara zêde û perçebûn û veqetandinên nerewa yên ku qewimîne tên yek wateyê; hevdû wek kes qebûl nekirine, li hev guhdarî nekirine, kurdayetî nekirine(bêtir kesayetî ye), bawerî bi hev du neanîne. Nimûne: di rêkeftina Duhokê ya dawî de çar serok amade bûn ku di salên dawî de ji yek partiyê cuda bûne.
Ji ber ku li Holenda dijîm, dizanim bê endamên partiyan di çi qonaxan re derbas dibin, taku dibin serok û berpirsyar û siyasetmedarên baş. Heçê meyla wî/wê li ser siyasetê hebe di ciwaniya xwe de partiyekê li gor fikra xwe dibijêre û dest bi çalakiyan dike, siyasetê dixwîne, hin ji wan beşên bi siyasetê ve têkildar di zankoyan de dixwînin, û pêre jî dest bi xwendina pirtûkên siyasî û korsên siyasetê vedikin, jixwe tim çalak û bi çalakiyan radibin. Nefsa wan piçûk e, berjewendiyên giştî tim û tim didin pêş, tim jî di bin çavdêriya endamên din de dene. Eger endamek şaş çû rexne dibe, û bi hesanî dikare bê qewitandin, taku serokê partiyê be jî. Serokên partiyan, Serokwezîr, berpirsyarên mezin di bin çavdêriya timî dene û tên rexne kirin.
Li ba me, li Rojavayê Kurdistanê bêtir welatparêzî tê meşandin, û welatparêzî ne siyaset e. Bêtir kîn û pirsgirêkên kesan bûne egera perçebûnan û zêdebûna partiyan, jixwe ku partî zêde dibin, serok û pirsgirêk jî zêde dibin. Serok û partiyên ku ana li R.K hene, hemû ji hev û du cuda û perçe bûne, ne li ser bingeh in fikrî û niştimanî, bêtir ji ber egerên kesayetî û nezanî cuda û perçe bûne, çimkî cudabûn di rêbaz û armancên wan de tune, dîsa wek hev in û di her tiştî de dişibin hev.
Di nav partiyên me de bawerî tune, eger heba wê ne tim serokên partiyan li her deverê amade bibûna, bêtir endamên partiyan koletiyê dikin, rêncberiyê ji serok re dikin, û ji ber wê siyaset bi pêş ve naçe. Ta partî û partî jî li hev nakin, wek şerê li ser kursiyan di ENKSê de, di wexta ku gelê me koçber dibe, Kobanî wêran dibe û herêm bi giştî ser û binî hev dibe.
Eger gotina me nerast be, çima em nivîs û gotarên serokan di medyana kurdî de nabînin û naxwînin, çima nikarin gotar û şiroveyan binivîsin, çima di medyana civakî de neçalak in û bîr û boçûnên xwe nanivîsin û şirove nakin, belkû newêrin derkevin pêşberî xelkên xwe. Belkû hinan ji wan di jiyana xwe de pirtûkek siyasî nexwendine. Jixwe em nabêjin çima bi zimanê kurdî nanivîsin, û nizanin bi kurdiyek paqij û zelal biaxivin. Ta di axaftin û hevpeyvînan de nizanin bersivên siyasî û baş bidin, nimûne: pirs ji berpirsyarekî tê kirin: ta ana we xwe ji bo pêkanîna rêkeftina Duhokê amade nekiriye? Dibêje: aliyê din jî xwe amade nekiriye…hhh.
Gelê kurd bêhêvî bûye, heçê bawer nake ku gelê kurd li R.K ji partî û serokan xemsar û bêhêvî bûye, bila lêkolîn bike, ji ber jimara partiyan a zêde û dîtin û amadebûna eynî kes û serokan li her deverê, jixwe tiştekî jî çareser nakin, nimûne: berdana girtiyên kurd ên di zindanên aliyê din ji rêkeftina Duhokê. Gelê kurd ji kiryar û 2rûtiya wan xemsar û bêhêvî bûye.
Pirsgirêka herî mezin ew e, ku hemû serok û partî texmîn dikin ku ew serokê hezkirî û partiya herî mezin e, û ku ne bi rêya serok û partiya wan be Kurdistan rizgar nabe. Texmîn dikin ku hebûna wan pêwistiyek dîrokî ye. Em jî dibêjin: heçê ji bo berjewendiyên giştî bike, tim xwe nade pêş, ji xwe dadixe û dixwe da ku lihevhatin û dilxweşî peyda bibe.
Bi texmîna min, serokên partiyan bêtir ji çareseriyan, bûne pirsgirêk. Em bi hewceyî guhertinên mezin in.
Li dawî,"welatparêzî nesiyaset e".
Her kes dikare welatparêz be, lê her kes nikare siyasetmedar be.

# Rewşenbîr (Behaneyin Taybet)



Xoşman Qado

Têye zanîn ku rewşenbîr hişê civaka xwe ye, ji ber ew ji aliyekî ve têghiştina pêvajoya pêşketinê baş dizane, û ji aliyekî din ve êş û pirsgirêkan jî baş dizane. Lê gelo ta çi astê ev pênasîn cihê xwe di civaka me yî kurdî de dibîne, nexasim li Rojavayê Kurdistan.
Ger em bibêjin ku rêjîma Sûriyayê bi siyasetin pir qirêj bandor li civaka kurdî kir, û di nav de rewşenbîr, ew rêjîm her tişt qedexe kir, û tenê buhêrekek hişt da ku rewşenbîr kar û xebatên xwe bikin, jixwe tim behaneya kesê rewşenbûr ev bû, ku çi derfet li pêşiya wan tune ye, û divaye ku bi vî şêweyî binşêweyê ku wan dûrî civaka wan bibe- ji ber dezgehên kurdî yên ku girêdayî partiyan bûn, ne di asta hişmendiya wan de bû, pê re zimanê kurdî di nav wan behaneyan de wenda bû, û zimanê erebî bû nûnerê kesayetiya wan î seqet, û bûn xwedî ezmûnek û ciyewaziyek taybet di nivîsên zimanê erebî de, ew jî, ji ber bikaranîna hest, hiş û têgehên ziman û civaka kurdî. Tevî ku di heman demê de bi dehan kesên rewşenbîr hebûn, berovajî wê rewşê, buhêrekek din ji xwe re dîtin, û kar û xebatên xwe ji bo ziman, çand, dîrok û civaka kurdî kirin, ligel hemû zehmetî û astengiyên ku dihatin pêşiya wan.
Ew rewş pir tevlihev e, ji ber ew qonax hêja ye gellek lêkolînan, û jixwe em ne dadgeh in ji bo dadgehkirina mirovan, tenê pêdîvî bi helwestan heye, ango, gerek e ku deriyê rexnê bi awayekî zanistî li pêşiya van rewşan vebe. Lê çaxa ku em aniha li ser heman rewşê rawestin, dê çi guhertinin mezin wê tune bin, dibe ku behane bên guhertin, lê sedem her dimîne ew, bercewendiyên kasayetin seqet, ku ta roja îro nikarîbûn bingehek durist ji hişyariya civaka kurdî re pêşkêş kiribanan, lewra rev ji wan re çareseriya herî hesan bû, da ku têkçûnên xwe bi rengekî dîtir ji civaka xwe re diyar bikin.
Îro roj rêjîm li Rojavayê Kurdistanê nema, ger li deverna jî hebe, ew bê rol e, û çi bandoreke wê yî xuyayî tune ye, lê rewşenbîran behaneyeke din ji xwe re dîtin, ew e ku desthiladariya partiyane rê nade ku em bi rehetî karên xwe bikin, tevî ku gellek navend, rêxistin, komele û yekîtî hatin damezrandin û kar û xebatin berfireh di bin siya vê desthiladariya nû de kirin, jixwe astengî û pirsgirêk hebûn, ev ne tiştekî veşartî ye û ne jî tiştekî seyr e, lê pirs ew e, gelo ger rewşenbîr li hembrî desthiladariyê ranewste, û ger nebe pêşengê civaka xwe, wê çawa bi erkê xwe mîna mirovekî hişêmend rabe; lewra ji ber gellek behaneyan xwe dide alî û xwe ji civakê dikşîne, ji ber ew bi xwe nikare çi tiştî ji civaka xwe re pêşkşêş bike, her wisa di avakirina kesayetiya xwe yî rewşenbîrî de xwe amade nekiribû ji qonaxeke wilo re, ji ber ew nakokiyên di navbera wan de, hişte ku her yek ji wan dûrî civakê bikeve.
Rewşenbîrê Kurd hewil neda ku têghiştina hişê civaka xwe bike, û nikarî bû bi mejiyê mirovê Kurd mijûl bibe, ji ber zimanê ramanê li cem wî ne zimanê Kurdî bû. Ev tişt bi xwe dihişt ku nakokî di hundirê kesayetiya wî bi xwe de çê bibe, û bandora vê zirzya bê hempa aloziyek duta di civakê de peyda dikir: Carekê di rêya têkiliya mirovê rewşenbîr bi hişê tevayî re di civakê de, û carekê jî di rêya wê diyardeyê re ya ku dixe nav civakê, ku li gorî wê bingeha pêwendiyan- di navbera kesayetiyên mirovan de- di civakê de ava dibe.

# Hişmendî

Bavê Serbest

şeş- sed salî berê Zayînê Hîrodot dîroknasê Yûnanî di pirtûka xwe ya dudwan de, li ser jiyan û hişmendiya feylesûfê Yûnanî Îsob diaxive û dibêje: Îsob di pêşya temenê xwe de bende bû, lê zanyarî û hişmendiya wî di rojên pêşîn de ji temenî wî hate ber çavan. Îsob mirovekî form e û bêpergêliya wî pir nexweşik bû, çawa serê wî mezin û dirêj bû, bejin kin û zik tilêr bû, ziman pelt û çav şaş bû, bi hemî awayên xwe bê pergêl û bengînî bû û jiber rengê wî yê reş wek Efrîqiyan jê re digotin Îsob (Esyûbî).
Dema ku xewacê wî ew anî firotinê bi du bendeyên dîre mîrekî bi navê Gizînfon ew bazar kirin, û ji xewacê wan: Gelo evana çawane ,û ji herdû hevalên wî re got: Hûn çi karî zanin bikin.
Gotin: Em her karî zanin heman pirs ji Îsob kir .
Got: Tiştekî nizanim ji ber herdû hevalên min kar ji mire nehştin . Bi vê bersevê Gizînfon nas kir ku razek li pey heye.
Başe heger keysa te lê bê tê nereve?
Başe ma te bihîstiye ku keysa çûkê rikeyê lê bê wê nereve? Dîsan Gizînfon jê pirsî heger ez karekî bidim ber te, tê cihê ewlekarî û behweriyê be? Got :Belê ez ê rastego bim ger tu min bikirî yan na. Forma te nexweşik e. Belê feylesûf mirovan bi hişmendiya wan dinirxînin ne bi reng. Gizînfon nas kir ku Îsob mirovekî hişmend e, paşê ew kirî.
Dema çû malê xêzana wî ji forma Îsob ya nexweşik veciniqî û got: Ev çi hovê qereçiyan te ji min re anî , lê Gizînfon got: Na na delala min ew bi xwe westiyayê rê ye û pir hişmend e tê pê re hêsabî em ê bi wî dilniya û dest kewlî bin. Îsob hat sitûbarkirin bi miqatebûna baxê û bû cê behwerî û ewlekaryê li ba mîrê xwe, ji ber vê yekê herdû hevalên wî lê bi gir û kîn bûn, çavreşî avêtinê ketin nava hewildan pîlan faq û davên xerab ku li riya Îsob vedan, navê yekî ji wan Agasobosbos bû .
**Lê behre û hişmendiya Îsob çawa eşkere bû û derkete holê**
Careke kodek hejîrên nûderketî ji Gizînfon re hatin, gote bendeyn van hejîran deynin ser masê kêlîkekê ez ê dakevim serşokê canê xwe bişom paşê ez ê hejîran bixum. Dema Gizînfon pişt da wan herdû bendeyên hevalên Îsob hejîr xwarin, dema Gizînfon ji serşokê derket herdwan tilyên xwe ber bi Îsob vekirin bi hev re gotin: Ewî hejîr xwarine, û bi qamçiyan li Îsob dan, ferestin ji Îsob re nema bi lezgînî xwe avête ser herdû pêyên Gizînfon û maç kirin got: Kêlîkekê derfetê bide min. Gizînfon got: Bêje bi lez. Îsob kodek vala anî û tilya xwe xist gewrya xwe (qirrik) û verişya got: Temaşe bikin ka hejîr tê de hene yan na, û tiliya xwe ber bi wan de vekir û got: Bera ew jî mîna min bikin. Lê wana di pêşîn de erê nekirin ser daxwaza Îsob. Gizînfon ew neçar kirin û got: pêwîst e ku hûn jî mîna wî bikin. Dema ku ew jî verişyan Gizînfon dît çawa perçê hejîran ji devê wan têne xwarê, Wê gavê hişmendiya îsob xweş hate ber çavan, û bû mîna şêwirdarekî zana ji bo mîrê xwe.
**Çawa deng bi Îsob ket û bû feylesûfekî navdar ne tenê li ser asta bajêr belê li tevaya welêt bi giştî .**
carekê qiralê Lîdya (kurtosis) bi riya şandekê gef li cigirên bajarê Samos xwarin û doza dana bacê li wan kir got: Heger nedin bi aştiyane ez ê welatê wan tevî dagir bikim û rûsipyên bajarê we tev bibin dîl li ba min.
Wê hingê kubox û zanyarên bajêr tev civyan da ku bighên biryareke giştî çawa berevaniyê di ber welat de bikin û arîşeyê bi aştiyane çareser bikin û bi çi awayî. Bi giştî tevan dîtin ku artêşa wan ne himberî artêşa qiralê Lîdya ye pêwîst e ku bi aştiyane welêt radestî qiral Lîdî bikin. Wê hingê Gizînfon axivî û got: Çi raya we ye ku bendeyekî min heye pir hişmend û zanaye danê sibe ez ê wî bînim vê derê bera ew jî raya xwe bêje û dibe ku çareseryeke din ji vê pirsgirêkê re hebe. Tevan erê kirin ser pêşinyara Gizînfon. Roja didwan Îsob hate civakê di nava wan de rawestiya û got: Gelî zanyar, kubox û rûsipyên bajarê Samos îro du rê li pêşiya me hene, yek jê di pêşî de pir fireh, hêsa û aram e, lê li dawî tev xark kelem û azarî ye ew rê jî riya ku em xwe bi aştiyane radestî neyar dikin.
Riya dî di pêşî de pir zirav û tenge tev zor û aloz e, lê li dawî firehî û xweşî ye, ew jî riya berxwedan û berevaniyê ye ku em di ber welatê xwe de bikin.
Wê hingê raya teva hat guhertin û berevanî di ber qada xwe de kirin û êrîşkar şikandin, Bi vê pilana hişmend Îsob deng pêket û azad bû, û wê gavê bû şêwirdarê qiralê welêt bi giştî.

# Xwekuştiyo … Ne buhiştiyo

Ibrahîm Xelîl

Ji Adem ( Homo sapiens ) û vir de, mirov bi ser bîrokeya " mirin " ê ve bû, nas kir ku ew çi temenî bike, kin yan dirêj, ewê dawî wek qurmê darekê bê libat li erdê rast bibe (bimire). Ew şahê keşweran be, gedayê sikakan be, li jor be li jêr be, li rojhilat be li rojava be, ewê dawî bibe termekî hişk ji veşartinê re yan ji şewitandinê re yan ji keftar û qertelan re.
Lewra ji mêj ve, hêviya "Nemirin"ê hatiye xewna wî û di serê wî de geriyaye.
Di mîtolociya Babil de, Gilgamêş dide dûv "gihakê nemirinê" lê mixabin piştî ku bi dest dikeve, dîs wenda dike.
Di dîroka olî de, Nemrût burceke pirr bilind ji xwe re ava dike ku destê mirinê negihêje wî lê ew burca wî bê kêr bû, û pêşiyekê xwe gihande jor û kete bêvilê de û ruh jê bir.
Li her derê û di her demê de, mirov çav berdaye vê hêviya nebûyî û nekevtî, lê tucarî vê hêviyê jiyana milletan û asayişa civakan lihev nexistiye û tev nedaye wek roja îro.
Ji bextê me yî reş re ku ola Islamê ji 1400 salî ve sozek daye wan kesên qenc û bawermend ku cihê wan ê buhişt be, dera ku ne mirin, ne westiyan, û ne nexweşî lê peyda dibin, li gel ku her daxwaz û mirad ê li ber dest bin çi jin û çi xwarin û çi vexwarin.
Piştî 1400 salî, cîhan ji gelek qûnaxan buhurî, roja zanînê li mejiyên mirovan hilat, kesî nema serê xwe bi çîroka razên jiyan û mirinê êşand, û armanca pirraniya komar û destelatan bû ku vê zemînê ji xelkên xwe re bikin buhişt.
Tenê Misilmanên me ji vê aferîna Xwedê bêpar man, tenê Misilmanê me îroroj ( zayîndeyekî efsaneyî ) ye, hest dibe ku ne ev dem dema wî ye û ne ev cîhan cihê wî ye lewra ew xwe ji her tiştên cîhanê dûr dixe û dixwaze îro berî sibe jê derkeve û hilkişe ber bi jor ve, dera ku Xwedê jê re bi kelpîçên zêr û zîv ava kiriye, hûrî di nav livînan de jê re rast kiriye, û hingiv û zencebîl û mast jê re di sîtilan de meyandiye.
Dergevanê vê buhiştê jî li ser erdê ewe ew kesê ku li ser şîrê kerê mezin bûye, riha wî du buhişt û nîv in, û kirasê wî ne dirûtî ye, şaşikekê dide serê xwe û simbêlan d'avêje. Derencam, yekî ku şeytan ew ji çola Ereban hilkişandiye û ew bi şaştî avêtiye çerxa bîst û yekem.
Ev kes û şagirtên xwe yên nîvrazayî ne hew dixwazin biçin buhiştê lê dixwazin me jî bi xwe re bibin, me bivê me nevê.
Heger ev bêhiş kêlîkekê tenê bi mejiyê xwe re rûniştiba ê naskiribana ku :
- Xwedê ne destkurt e, û heger viyaba wê hemû mirov kiriba qenc û bawermend û buhiştî
- Ola ku cihê şerkerê di ber Xwedê de kiriye buhişt, wê olê bi xwe cihê xwekujan kiriye agir û dojeh.
- "Nemirin" yek ji sîfat û akarên Xwedê ye ku ew tu kesî ji xwe re tê de nabîne wek şirîk û hevbeş.
- Amerîka û Ewropa ( yên filleh ) îroroj deh qat ji Misilmanan xurttir in, û ku ew bixwazin ( Cîhada Xaçparêziyê ) dîs lidar bixin ewê bê guman bi ser bikevin, lê ji bextê me yî sipî re ku serokên Ewropa ji yên Misilmanan bîrwertir in, bihna Obama fireh e, û ya Xwedê firehtir e.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpress@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer PRESS Nûçe Bi ... Zelalî

# Mihemedê Cemîlê Seyda

## *Cara Yekem e Ku Hûn Vê Hevpeyvînê Dixwînin*

***- Min û Nûredîn Zaza pilana kuştina Qunsilê Tirkî dikir, dema Mîr nas kir, em dan ber xêzerana û got ez ê we dax bidim.!***

***- Nexşeya Kurdistanê ku min çêkiribû şewitandin, bi pihîna li serê min xistin ta ku ez "ker" bûm..***

***- Mana Kurdan li Sûrî" Demkî ye" Yan wê tevlî Bakurê Kurdistanê bibin û yan wê tevlî Başûr bibin.***

***- Di sala 1951ê de, Cegerxwîn, Reşîdê Kurd, Osman Sebrî,û Osmanê Biro bûn mihvanê min, ji min xwestin ku ez bibim Komênist***




**Mihemedê Cemîlê Seyda kî ye?**

Navê min Mihemedê Cemîlê Seyda ye, min bi navê "Perwer" kar dikir, Ez li bajarê Licê di sala 1918an de hatime dinê. Bajarê Licê girêdayî Amedê ye, min zaroktiya xwe li wir derbas kir, li wir jî min di sala 1925an Şêx Se'îd Efendî dît, di sala 1930î de fermana bavê min rabû, û em hatin Amûdê. Li wê derê diya min çû ber dilovaniya Xwedê, bavê min ez birim Şamê, teslîmî rehmetiyê mîr Celadet Bedirxan kirim, jê re got: "Ev kurê te ye"! Rewşenbîriya min î Kurdî û zanebûna min hemî ji mamostê min mîr Celadete Bedirxan hatiye. Ez heta 1942an li Şamê mam, paşê hatim Cizîrê, Min dest bi nivîsandinê kir, min Nexşeya(Xerîta) Kurdistanê çêkiribû, Muxaberata ez girtim, Xerîta Kurdistanê şewitandin. Piştî ku ez ji zindanê derketim min carek din dest bi nivîsandinê kir û min Ferhenga xwe ya bi navê " Jîn" nivîsand.

**Hinekî li ser malbata xwe biaxive?**

- Bavê min Cemîlê Seyda di sala 1820an hatiye ser riwê dinê, ew kurê Subxetulah kurê Resûl paşa yê Rewandûzî ye, Resûl Paşa birayê Mehkûm Mihemed Paşa bû. Wê çaxê fermana me rabû û kalkê min hat Licê. Li wê derê kalkê min Seyda "alimekî "mezin bû ( تحفة ابن حجر) ji me re got, dîwana wî heye. Gelek kitêb nivîsandibûn kiribûn, Tirka şewitandin, Mele dikanek wî hebû, hemû Mela dihatin cem ji bo fêr bibin, û hîn jî li Licê dimîne, navê wê dikana" Mele ye". Di 1937an de şoreşa Dêrsimê pêket Elî Riza mezinê Dêrsimê bû peyamek şiyand ji Ebdulrehîm birayê şêx Seîd Efendî re, ew jî li Sûriyê bû, jê re got: "Mehkûmê binxetê bid hevdû, ji bo xatirê bibin qewet û hûn werin alîkariya me bikin". Mektûb hat bavê min bire Şamê û da Ebdulrehîm, xelkê xwe jê vedizî .!? Ebdulrehîm hat û 18 peya pêre bûn û berê xwe da ku here Dêrsim. Casûsek bi wan re hebû ew casûs kurmanc bû. Bavê min ji Ebdulrehîm re got :"Evaya bera neyê"? Ji bavê min re got:" Ma wê çi bike baltû tenê pê re ye"! Vî casûsî nivîsî , kî hevalê wa ye û bi çi awayî wê herin, û herin ku derê, hemî nivîsî, gihan "Seletê" ber çemê Amedê, li Seletê mexfera Tirka hebû, ji xwe re paldan westiya bûn, ê casûs xwe vekişand bi dizî û xwe gihand mexferê , û ji wan re mesele hemû got û va li vir in, îca telefon dan Amedê û (نفير عام ) li wan rabû, dinya buhar bû û genim jî li dar bû, muxtar û 8 nefer hatin ser wan, her 8 nefer hatin kuştin, qewet hat îca çara wana nema xwe avêtin nav genim. Di nav genim kîjan esker serê xwe derdixist dihat kuştin, rabû îca agir bi genim xistin, berê xwe dane bakur û 18 fîşek li bavê min û Ebdulrehîm ketin.

*** li ser şoreş û serokên wan ê ku li Bakurê Kurdistanê rabûn biaxive?**

Kurdistana Tirkî di wexta Şêx Ubeydulahê Nehrî ve û şoreş û berxwedan lê nesekinî ne, Şoreşa Şêx Se'îd Efendî, wî samanên xwe hemû ji bo şoreşê xerc kir, Şêx Se'îd Efendî hîna kesek mîna wî wek kesayetiyek oldar ranebû ye, ne wek hemû Şêxên Olî di nav Kurdên Bakur de, û gelek navên din jî hene şoreş vêxistine, çi bi çekan û çi bi zaniyariyê wek:Dr.Fûad, Fihimî Bilal, Xalid Begê Cibrî, Erif Paşa, Şêx Ebdulrehîm Efendî, û wek me got jî hinek dî jî rabûn û şoreşa zaniyariyê vêxistin û pê re jî hin hewldanê şoreşên çekdarî jî kirin wek: Celadet û birayê xwe Dr. Kamîran Bedirxan Qedrîcan, Osman Sebrî, Reşîd Kurd, Bozan Beg , Mustefa Beg mezinê Beraza, Haco û 6 kurê xwe, Ebdurehmanê Eliyê Yûnis, Elî Seydo Goranî, û Cegerxwînê Hesarî.

Fehmî Bilal xwendina wî li Parîs bû "Feylesûfekî "mezin bû, siyasetmedarekî payebilind bû, dolabê şêx Seîd û Dr. Fûad dimeşan, ji şêx Seîd re gotin:" Fehmî limêj nake"? Got:" wele divê hinek weke Fehmî li cem me hebin, ma kî wê here danûstendinê bi Ecaniban re bike"?!

*** Fehmî Bilal kî bû?**

- Eslê wî ji Licê ye, bavê wî mele bû , çû Firansa û li wê derê xwend. Bû berpirsê muhamata di şoreşa Şêx Se'îd de, di wexta şêx Se'îd de hat girtin, û dan mehkemê, hemû mihamiyên Tirkan lê civiyan zora gişa bir. Ji zindanê reviya Binxetê, û paşê dîse vegerya Serxetê, xiyanet lê bû û hat kuştin..!

Dr. Fûad mêrê bi sed mêran bû, ew jî hat girtin, berî ku wî bidar ve bikin got:" Odeyekê ji min re amade bikin ez dixwazim bi jina xwe re xelwe bibim, rabû ji wan re şerşefek vedan, gava ji bin şerşefê derket ava xwe pêş wan kir, û gote jina xwe" Eger ji te re kurek çêbû navê wî bike Fûad ji bo zanibin ku Fûad nemiriye" Û piştî neh mehan ji jina wî re kurek çêbû û navê wî kirin Fûad û niha li Feransa ye, û gelek bervanî ji bo kurdan kiriye..

*** Sedemên têkçûna wan şoreşan?**

Jiber ku nexwende û nezan bûn! Wek ku min diyar kir ewqas navê ku şoreş vêxistin ji Beg, şêx û mal mezinan bûn, wisa jî hebûn ji Bega, Axa, şêx û Mele li dijî mafê gelê xwe disekinîn, û şerê şoreşê jî dikirin.Sedema mezin û sereke ev bû.

Hûn ji bo tevgera kurdî ya siyasî li Sûriyê çi dibêjin?

Ez dibînim ku mana Kurdan li Sûrî" Demkî ye" Yan wê tevlî bakurê kurdistanê bibin û yan wê tevlî Başûr bibin, tu îşê me ji vir tune..!?

* We kengî dest bi karê ferhenga xwe kir?

Bîranînên min jî hebûn min ji sala 1940î heta 1980'ê nivîsandibû, û pêre jî min dest bi karê ferhenga xwe kiriye ku min navê wê kir"Ferhenga Jîn" û du pirtûkên din jî hene "Elfebaya Kurdî" û " Tekoşîna Min" Û wek min di despêkê de got dema ez hatim girtin gelek berhemên min hatin şewitandin..

*** Tu nabînî ku pirtûkxaneya kurdî hîn feqîr e?**

Jiber ku nivîskarê kurd di Sûriyê de feqîr e, loma ew nikare pirtûkên xwe çap bike, û rêjîma be'siyan zimanê me qedexe kiriye..

*** Eger tu niha xort bana, te yê ji bo Kurdan çi bikira?**

Jiber ku ez şagirtê Mîr Celadet û Kamîran Bedirxan bûm, ez ê vegerim û wan fêrî zaniyariyê bikim, wan fêrî ziman û wêjeya kurdî bikim, ez 14 salan li rex wan mam wisa fêrî çanda netewa xwe bû me.

*** Ji me re li ser qonaxa ku dixwestin te bikin Komênist biaxive?**

Erê tê bîra min, ez û Mele Hesenê Kurd (Hişiyar) û Ebdê Têlo, û mele Ebduleyê Mele Reşîd, em her çar nebûne Komênist(Şo'î)..!

Di sala 1951ê de, ez melayê gundê Gir Bêjing bûm, Cegerxwîn, Reşîdê Kurd, Osman Sebrî,û Osmanê Biro bûn mihvanê min, ji min xwestin ku ez bibim Komênist, du rojan man mihvanê min, û me gelek giftûgo kir lê qet jî min bi ya wan nekir û nebûme Komênist, ji ber ku Mîrê min Celadet Bedirxan gotibû min, " nebî nebî tu bibî Komênist".! Vêce wan sê çar mirîşkên min jî xwarin û çûn..! paşê Cegerxwîn di çaxa kongirê "Baldoskî" yê Komênistan de, Cimşîdê Celadet Bedirxan şand Elmaniya wek nûnerê wan. Komîta navendî ya Partiya Komênist peyamek şandin û tê de eşkere kirbûn ku ew nûner ne yê partiya me ne, ew dijminê me ne..!

Li vir gelek kesayetiyên Kurd ên hevalê partiya Komênist jê veqetiyan. Mîr Celadet digot:" Piştî dor 700 salê dî ku Ol nemînin û netew jî nemînin wê çaxê wê Komênist biser bikevin"

*** Tu dikarî hindekî li ser girtina xwe biaxive?**

Wek min gote we min nexşeya Kurdistanê çêkir bû "100x80 SM" bû, ez ji bo wê nexşeyê girtim bi pihîna li serê min dixistin heta ku ez "KER" kirim, paşê Ez birim dadgeha eskerî, yê dadgêr eskerî bû, cîgirê giştî sivîl bû wî ji min pirsî:

*- Tu çima gihişt sînorê Feratê?*

Ezbenî pirsgirêk tune ye, vegerînin sînorê Xabûrê, em ê lihev werin.-

*- Ne wek we ye, hûn dibêjin ta Feratê û Cihû dibêjin ta Feratê, ma em ê bi ku ve herin?*

- Ji xwe re çareyekê bibînin.

Ez bi du salan hukim kirim, û min ew herdû sal di zindana Siwêda de qedandin..

* Li ser wan salên ku tu li mala Celadet Bedirxan bû biaxive?

ez 14 salan li mala wî mam, dibistana min danê êvarî bû, hevalê min ku dihat mala mîr Nûredîn Zaza bû, mala Mîr Celadet her çax tije mêvan bûn, kî li kû derê didît ew tanî mala xwe, û jê re ziman û wêje û dîroka Kurdî dixwend, û wisa jî dema ku "Rojê Lîsko " hate mala wî, min pirsî Mîr ev kî ye?Gote min:"Ev firansîkî Kurd e"

Min û Nûredîn Zaza pilanek hazir dikir ku em demaçekê bînin û pê balyozê Tirkiyê li şamê bikujin, vêce Ehmedê Ferman xulamê Mîr Celadet dengê me dikir, û ji mîr re got, wê çaxê em çûbûn wî bikujin, da pey me û em li Ce'da Bexdad zeft kirin, gote me siwar bin, em birin mekteba xwe, derî girt û rahişte xeyzeranê xwe û ku derê we têşe"Hûnê Qunsil bikujin haaa welah ez ê we dax bidim, ma ev kare hûnê bikin" me gotiyê erê em ê wî bikujin û mala wî li Muhacirîn e, û her roj ew tê Gulîstanê û serê wî rût e, ma çima ew zilmê li me dikin û serê kurdan jî jêdikin.

Mîr gote me piştî ku laşê me ji xeyzeranê xwe şîn û reş kir: "Kurê min em hemû li vir li Şamê ne, ola dewleta Feransî nîne, eger me tiştek wisa kir wê Feransa Komela Xuybûnê radestî dewleta Tirkan bikin" Rabû mîr destê xwe avêt berîka xwe deh qurûş dane me, û gote me herin Sînemê..

* Hindekî ji me re li ser çûna xwe cem Berzanî biaxive?

- Di sala 1971ê de ez çûm cem Barzanî, em çûn oda wî, 50 pêşmerge tê de rûniştî bûn, dema ku derbas bû em giş ji ber rabûn, rûnişt û we`zin ji Quranê kirin, Barzanî bavê min nas kir, ez jî rabûm ku ez wesfê wî bidim, destê xwe li milê min xist got:" Ez bavê te xweş nas dikim, bavê te têkoşerekî mezin bû, eferim ez gelekî spasî Xwedê dikim ku ê wek we şiyar bûne û hûn hatine serdana Kurdistanê, inşele em ê daxwaza xwe bi cih bînin". Ez carek din jî çûme cem Barzanî, sê çêlekê min hebûn hatin dizîn min got nikarin bibin Tirkî lê belkî birine Iraqê ez çûm min baspora xwe li cem qayimeqam çê kir, çûme Rebî'a, Elî Şingalî û Elî Seydo Goranî li Musilê bûn mixabin ez çûm ne hazir bûn, min berê xwe da "Hewlêrê" serok Barzanî dîs ez nas kirim, gote min:" Xêr e"? Min got: ne xêr e, sê çêlekê min hatine dizîn got ma li vir in? Min got ez nizanim, got ma tu şeklê wan nas dikî? Min got erê. Rabû li nav Pêşmergeyan belav kir û gote min wê li çêlekê te bigerin, Ev Barzanî bû guh dida her tiştî çimkî serok bû, û serok divê guhê xwe bidin êş û derdê gelê xwe, tevlî ku şoreşek vêxistibû dilê min nehêla û alîkariya min kir.

Bû roja dî pêşmergekî û erîfekî di cêbê de ne, Gotin Mihemed Cemîl Seyda, were va me çêlekê te dîtin, me li Şingalê ew girtin were biner bê ew in ne ew in? Ez çûm ku wa çêlekê min li "merkeza Partî "girêdayî ne, min got we ji ku anîn , gotin me ji Qabûsiyê anîn, Qbûsiyê bi 1KM di biniya Şingalê re ye. Bû roja dî çêleka di jî anîn, her sê çêlekê min anîn . Kirin kemyonê de û ji min re û gotin de siwarê , em hatin Mûsilê, gotin tu nebêjî pêşmergeyan alîkariya min kirin wê te bigrin haa , bêj min çêlekê xwe dîtin!Li Mûsilê gotin ka diz? Min got diz reviyan min çêlekê xwe anîn, gotin min (, مع السلامة الله معك) Mebesta min ji vê çîrokê ku ez Barzanî wek mirov ji we re bidim nasîn..

Di dawî de ez vê helbestê diyarî we dikim ku min li ser Seydyê nemir Cegerxwînê Hesarî çêkiriye.

Silavê gewher û pirxweş we anî
Verêkim bo Cegerxwînî cîhanî
Cegerxwîn pir gelek zana û jîr e
Ji bo Kurdan weke seydayê Xanî
Mele û Xanî û Bedî'
Spasan dikin ji bo te her zemanî
Bi dîwanê te pir şabûn
Cegerxwîn çi ku kin bûn ji wan pirsên biyanî
Li dunya min nedîtî kes wekî te
Egîd û şêr û mêr û palewanî
Gelek rencî te kêşa pir ji bo min
Di zindana di her warê biyanî
Te barê pir giran da ser milê xwe
Bi dîlî hem bi dijwarî ji vanî
Ji ber ku te gelek kurd kir şiyarî
Li temara xewa êşa tu zanî
Se'îd û Qazî , Berzenî , Kawa
Ji xew rabûn ji tirba şadîmanî
Bi daxwaza te pir şabûn Cegerxwîn
Çikû azad te kir Kurdê xizanî
Li dunya min kes nedîtî wekî te
Egîd û şêr û mêr û palewanî

* Tu çi şîretê li xortan dikî?

Xortên me niha jîr û zana ne wê li mafê xwe bigerin û eger bidest xistin, wê lê miqate bin..

**Têbînî:**

*Ev hevpeyîvîn di 28.5.2005 ku mamoste Ridwan Mihemed Emîn bi Mihemedê Cemîlê Seyda re kirbû, û hîn nehatiye weşandin, mamoste Ridwan diyarî Rojnameya Bûyerpress kir, me jî dît ku wek belgeyekê ye û pêwîst e bê nivîsandin û weşandin, Em spasiya hêja Ridwan M.Emîn Dikin*

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpress@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer PRESS Nûçe Bi ... Zelalî

# Dawiya Piyalê

Hekîm Ehmed

** Bo Bîranîna Sêyemîn ya Koçkirina Helbestevan Emerê La`lê.*




***- Xem û xeyalên te ez revandim***
***Çol û bêlanan te ez gihandim***
***Ji ber te sotim te ez pijandim***
***Bayê evînya te ez hejandim***
***- Dildarê rûyê du singên te me***
***B`çeleng û çakî mêvanê te me***
***Ji ber fermana te heleste me***
***Sûnd bi serê te te ez helandim.***

*(Ji helbesta /Yara Pîroz/ Emerê La`lê /Rêncber/ ji dîwana wî /Xem û sawêr/).*


- (Xem) jiyan û (xeyalên te) xewnên min (revandim) ji nişka ve, (Çol û bêlanan) bi tenê birim (gihandim) dûr kesek ji bilî min wan xewnan najî, te (sotim) bi evîna xwe, tu bi min dijî (te ez pijandim) mîna xwarin û nan, teqez (bayê evînya te) bandoriya te, ez (hejandim) binbandor kirim.

- Di vê helbestê de helbestevan bi tevayî tê revandin, ne wek carê hiş yan aqil tê revandin, di hevoka duyem de bireserê didiwan (çol û bêlan) hatiye pêş ji bo lihevkirina mûzîkê bi xêza yekê re û ji bo lêker jî li dawiyê tevgereke bandoriyê bike di navbera peyvok û guhdêr (tu û ez) de, liv bêhtir dibe bi du lêkeran di xêza siyem de û têkiliya (ez û tu) berdewam e, tevî ku (te) li pêş e, bi bandor e, (ez) li paş e, binbandor e, wêne jî tev kilasîk in, berê hatine bikaranîn, zelal û diyar in çimkî pêkhatên wan ji dorhêlî û cîwarê Kurdan in (çol û bêlan, sotin û pijandin, ba û hejandin).

- (Dildar) ne tenê tu min direvînî û disojî, ez jî evîndar im, (rûyê du singên te) çelengiya çiyayên te welato min dikşîne, ez im (mêvan) ê ji riya te dernakevim (bi çeleng û çakî), ji bo te tim amade me (heleste me), tiştek ji te buhatir tune ye ji sûndê re.

- Piştî ku helbestevan di malika pêşîn de, bê viyan û biryar bû, tenê xwe dihişt di destê yara pîroz (welat) de, di malika duyem de eşkere dike ku ew (dildar) e, ango xwe xwedî rol û bandor nîşan dide, lêker jî di dema bûrî de bûn lê di malika dudiwê de, di dema niho de ne, ev nîşan dide ku tevî hemî bîranînên bi êş, ew hîna dilsozê evîna xwe ye. Dîsan jî wê qada taybet ya (ez û tu) diparêze û tevî yar li vir welate jî, lê ew evîneke wijdanî tekane diyar dike û welat di wêneya yarekê de dibîne û dikare wî hestê netewî bigihîne evîneke şeydayî bêhempa.

# Berxwedan Jiyan e


Hadî Behlewî (Nûhat)

Silav bo te (hevalo) berxwedan e
Li hawir te şer û ar û dûman e
Li nava Yekneyên Parastina Gel
We rê girtin li pêşiya dijminane
Li gel te Yekneyên Parastina Jin
Dixwin sûndê bi xwîna pakrewane
Biparêzin bi hev re xakî Kurdan
Bi azadiyê re danîn yek civan e
We pêlanê çete reşkîn û alreş
Beravêtî kirin xist bin piyan e
Dixwazin desthilatan Kurd birûxin
Li Başûr û li Rojava ewana
Wekî reşkê şevê hawîr bela bûn
Bi top û tang û hêz û ceblexane
Êrîş dabûn sînorê Kurd sera ser
Ji Şengalê heta şarê Koban e
Bi hezara zêç û zaro, qîz, kalmêr
Penaber bûn ji van karên hovane
Li Kobanê me aştî tê gurandin
Bi destê hêzê tarî tundrewan e
Mebesta wa ku Kurda der bi derxin
Bi hesta wa ku ev tişkî hesan e
Nizanî bûn wê rastî YPG'ê bên
Xwe ragêrin lehengin canfîdane
Bi hêza YPJ'ê û koma xwepexşan
Dikin ber gêriyê dij van çeta ne
Li enyê şer didin bersiv bi tundî
Bi sînga rût li rûber hawinane
Bi Pêşmergên li Başûr mil bi mil re
Berîvanyê dikin xûş û biran e
Wekî şêr û pilinga têne ba hev
Dibên Hewlêr û Koban Kurdistan e
Cîhan tev de bi rêzdarî dinêrî
Li şervanan ji wan matmayî mane
Heyamek çû li ser Kobanê cenge
Şerê Tîror dikî şûna cîhan e
Bi navê kelha asê hate nasîn
Li anîka hetawê xal û şan e
Ji Qamişlo ji bajarê evînê
Silavên min bighînin qehremana
Bi taybet jî, ji Kobanê re bêjin
Ji Kurda re tu bû man û neman e
Tu serberzî tu simbola xwe girtî
Te efsanek xwedî nerxek giran e
Wê destana te dîrok xweş binasî
Bi tîpên zêr li ser sînga zeman e
Gelê Kurdî ji bo te piştegêr in
Siloganek li ser lêv û ziman e
Bi yekrêzî bi yekdengî diba kin
Jiyana Kurd eve, ev berxwedan e

# Kobanê Jiyaneke Nû


Miş'lê Osman

Perperîkên berfê
Ji dil difirin
Û diçirisin
Lê welatê min
Deşta berêz
Qefa kêtikan
Warê hemê û ken'ê
Hêsir di nav dûmanê de bi dizî dibarin
Boraz*
Degirman *
Qenê *
Di bin avê de vemirîn
Mêrxasên Xizênê *
Ji dengê qurşînê
Zarok ji sîbra darê fisteqa bêpar man
Bazirganên xwînê
Sînorê goristanan fireh dikin
Bêrîvan *
Çav mîna du penceran
Li ser baxê hêviyan vekirî ye
Di qerbalixa deşta Sirûcê de
Xwenên rûmetê birêse
Arîn* … destanek gulgulî
De bila dem hinekî raweste
Da ku şevên min şiyar nebin
Bimînin di çalek jibîrkirî de
Te ha jê heye Arîn
Girê Miştenûrê
Kenê di çavên te de hembêz kir
Û keniya
Leyla Qasim
Bêrîvan û Arîn
Hêsir ji çavên hev dizîn
Pirs şiyar dibe
Çima Qereberkelê kal *
Di gaziya me de nehat ?
Çima şengal li ber lehiya fermanan diçe?
Kurdoo de ka were
Em tozê bidin hêlekê
Û bi hev re sitiranên evînê bêjin

---

*Boraz, Degirman, Qenê, Xizênê: gundên Kurdî li Kobanê ne.*
*Bêrîvan Sasûn: şervaneke YPJ bû di şerê Kobanê de bi guleya dawî di tifinga xwe de jiyana xwe bi dawî kir ji bo ku nekeve nav destê "Da'iş" de.*
*Arîn Mîrkan: şervaneke YPJ bû, di operasiyoneke canbêzarî de xwe li dijî çeteyên Da'işê teqand.*
*Qereberkelê: ziyaretek li Kobanê ye.*

# Dayika Şehîdan "Ferîde Elî" Tu megrî


Ehmed Mustefa

Ax ev çi qêrîn e!
Çi Şewat e çi birîn e!
dil bi fîxan û nalîn e
feleka bêbext bi kîn e!
Dayika Şehîdan tu megrî
Dayê dayîka min dayîka şahîdan e
Îro li me ferman e agir û dûman e
Zarokên me şewitandin ax ev çi talan e
Sînema agir pêket wax ev çi zeman e
Dayika Şehîdan tu megrî
Zarokên me şewitandin ji kîna sala ye
Biçûk in, bêguneh in dana Xuda ye
Ey Xuda tev perî ne ma ev çi ferman e
Li ser Amûdê di 60î de qêrîn û halan e
Dayika Şehîdan tu megrî
Sed aferîn ey dayika Ferîda
Bi şanazî tu dayika şehîda
ji agirê sînemê te zarok pir riha kir
dilê gelek zarokan bi jînê te şa kir
Dayika şehîdan tu megrî
Hawar e hey hawar e
Tu ji bîr naçî tucar e
Hawar e hey hawar e
kurd birîndar in dil bê derman e
Dayika şehîdan tu megrî

# Dûrbûn


Umran Menteş

Kevoka ser dara
Digrî li şûn wara
Da bi te re bigrîm
Li ser dost û yara
Dûrbûnê em kuştin
Melûl reben hiştin
Dil kovan çav sist in
Li ser dost û yara
Dûrbûn bû para me
Valabû tara me
Pel weşand dara me
Li ser dost û yara
Ezman digrî baran
Xunav a ser şaxan
Bilbil dikî fîxan
Li ser dost û yara
Xemê me bûn hezar
Stêr tev man şiyar
Hiliya berfa zinar
Li ser dost û yara
Heval û hogirin
Sînor derbas kirin
Hêvî me vegerin
Şakin dost û yara
Hêvîdar im ev dem
Biçin tev kul û xem
Nemînin ew kelem
Pêşya dost û yara
Ez û kevoka xwe
Gel bira, xwişka xwe
Zuhakin hêsirên xwe
Bicivin dost û yara .

# Hilma Ku Bi Destan Tê girtin


Salar Mela

Destê ku êşek negirtibe, kêr e.
Gul di vî xanî de, hilnayên. Gul tenê dibin muzîk.
Çawa ez ê ji bîr bikim, ku navê min li pişt wê darê hatiye nivîsandin.
Ji darê bi wir de, şevek heye.
Helbet navê ku hatibe nivîsandin wê navê min be.
Çawa navê yekî tê nivîsandin, bê ku bizanibe!
Niha kî be, dikare bê û ji min re bibêje: Were va meytê te!
Li wê dûrê hesin hûr dibin wek çavan.
Pira ku di bin wê de, termên 3ê cengan hatine veşartin, xwe di ser re davêjim.
Belkî hilma wan hîn sax be!
Çiya gava ku serxweş dikevin, di xew re diçin. Dengê evîneke dûr jî, eynî wisa ye.
Ax! Ey hêdîbûna havîneke ku dêşin leşkerên wê, nêzîkî wê bikevin xêzên zaroktiyê û bibin av.
Ew hiriya ku pişta nêrîna min dixwirîne, divê bişewite.
Gava ku tiştek li min tune be, ez ê laşê ewrekî li xwe bikim.
Wek şikeftên tu destê xwe didî wan, dibin bêrîkên baranê.
Wek gêrgêrîkeke paşla wê tije dengê lingên mirovan, biweşe tîfilî dawî ji dudilîbûnê.
Hêlîna ku ji qirşikan hatiye çê kirin, du çav tê de ne; Çavek ji bo vê dinê, çavek ji bo wê dinê.
Kesek neaxive, her yek gotina xwe bi qaşilê gotineke mirî bipêçe.
Ji wê newalê, dengê pelixandina "du deqeyan" tê. Du deqeyên ewil ji her tiştî
Bê simbil be, ey fîstanê daristaneke beradayî.
Ji erdê bilindtir, ji tirsê nizimtir, kêsteka xwe ya tenê danî.
Jihevdû derdikevin, dîwarê kevin û gewdê xatirxwestinê.
Ji bedewbûnê, şewqet tê.
Ji kezeba dayika şehîdan, welatek tê.
Li ber min dikuxe valahiyek.
Ez destê xwe didimê, ez destê xwe didim nuqteya dawîn a jînê.
Ez destê xwe nadimê, min dihêle û dimeşe.
Ez, ê ku herî zêde pêwîstiya wî bi valahiyê heye, were ey valahiya ku diçe!
Li vê dinê kesekî ji min bêtir, mêjiyê xwe nekola ye. Kesekî ji bêhna ku di nava du evîndaran re, çûye û hatiye, laşek çê nekiriye!
Li ser bênderê xwe diqurnisînim.
Her ez gavekê dimeşim, sipî dibe şûna lingên min. Ez disekinim, reş dibe.
Wek ez bibêjim; Dar, berf û kewa di nav darê û berfê de.
Qels bibe, ey çavê ku têr nerîn nabe!
Pisîkên ku duh kesekî av neda wan, îro wek gurên mirî, xuya dikin.
Dûmana ku ji devê deryayê derdikeve, li dû cama qeremûşkirî, wek kenekî ku ken jê çûye, xuya dike.

# Me Ji Hev Re Digot

***Hesen Hişyar ( Kurd )***



Meger em bê xwendevan, lew ku bûne dergevan (1)
Li me bû xewna şevan, dijmin li wan bûn mêvan (2)
Xwendin; bîr û bawer e, ne girtina diravan (3)
Kurdistan e, ne bustan, ne civata silavan
Heqgirtin e, ne xwestin, ne hêvî û bi lavan
Bi nav e xwe xwenas be, mekev av û çiravan (4)
Li ber te rê xuyaye, dibînî tu bi çavan
Çima dibê averê, dikevî bend û divan ? (5)
Bi rêzana xwe ve be, mebe segê dû şivan (6)
Bibe pêşeng û zana, dûr û dijî bednavan
Li tarîxê binêre; dibînî kurên bavan
Ew fedekarên me bûn, roj li wan çûye avan
Dive em jî li ser rê bin, bilezînin bi gavan (7)
Di roja cejna "Nûroz", li me bigrin silavan (8)
Ji qomanan dûr keve, kesek war lê ne girtî (9)
Ger şiyarî, eve rê, cengawerî û şervan (10)

1966

---

*1- berî cenga cîhanê a diduyan, li tevaya Cizîra Sûrî, li dor (50) kes niştiman perwer hebûn. Xwenda nebûn ji şêx û Melan pê ve. Hevsarê bihiştê xistibûn serê wan, şerê me dikirin. Me ji hev re digot: eger xortên xwenda hebûna nikaribûn vê keysê li me bînin.*
*2- piştî ku bi sedan duktor, muhendis û muhamî çêbûn, dewletên welat vegirtî, li wan bûn mêvan, û gomanên me bûn xwena şevan.*
*3- piraniya xortên xwenda jî bi peran hatin firotin, herwekî ji bo diravan ew diblom girtibûn.*
*4- bi armanca doza mafê millet xwe ve bendewar û xwenas neman. Bûn bawermendên rêzan û felsefe yên biyaniyan.*
*5- ji riya rast xebata welat aver ê bûn, ketin bend û davên daxwazên biyanî û welatvegirtiyan.*
*6- li ser rêzana xwe ya niştimanperwerî neman, bûn dûmdar wek kûçikên pê şivan.*
*7- dive em li ser riya wanên, ku bi mal û can ji bo xweseriya welat û millet fida kirine, li wê qonaxê bilezînin.*
*8- da ku em bikevin cedwela mêrxasan, ji bo di roj şahiya cejna "Nûroz" de, li giyanê me silav bê girtin.*
*9- bi gumanên rêzanên biyaniyan, kesek ne giyaye û nagheje, qonax û warek, daxwazan.*
*10- herwekî di (1105)ê koçerî de, rihberê me yê bilindpaye (Ehmedê Xanî) gotiye: " Bê deng û cidal û bê tehewir qet vî şuxlî mekin tesewir".*

*Ev helbest Ji erşîfa Dilawerê Zengî diyarî jo bo rojnameya Bûyerpress û yekem car tê weşandin.*

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpress@gmail.com
00905368908545

bûyer PRESS
Nûçe Bi ... Zelalî

# Di Malbatê De Rola Jinan…

Di nav Kurdan de cihê malbat çi ye? Rola jinan di malbatê de çi ye? Piştî ku bûye xwedî zarok cihê wê çi bûye? Bi Îslamîyetê rola jinan çi bûye?

Divê mirov ewil bersiva van pirsan bide.Belê bi rastî demên berê di nav civaka Kurdan de jin pir bi qîmet û girîng bûne. Her tim hêlîna xwe parastîye. Li cem zilamê xwe bûye. Him di karên çol û banîyan de him jî di şeran de her tim pê re bûye. Ji ber vêya mêran qedir û qiymet dane jinan. Li ser vê mijarê gelek lêkolîn hatîye kirin. Ji lêkolînê encamên balkêş derketine holê. Heya niha civakên rojava û rojhîlatê rolên jinan şaş hatîye zanîn. Lewra di rojnemayan û televîzyonan de..hwd em dibîhîzin ku,jin bindest in. Belê niha wisa ye. Lêdan dixwe, tacîz dibe,heqaret lê tê kirin hwd. Lê belê em lê dinêrin ku jinan ev rewş bi destê xwe nekirine. Pergal wisa hatîyê mêşandin.

Berê, ramana malbatê Kurdan pir girîng bû. Jidayîkbûna zarokekî girîng bû. Hurmet û qîmet gelekî girîng bû. Bawerîyek hebû ku malbat bi jin, mêr û bi zarok dihate holê. Di gundan de zayîbûna zarokekî di navbera 3 û 7 rojanda dihat pîroz kirin. Roja 7'an de navê zarok dihat dayîn. Heger bavê zarokekî ku nû hatîye dinayê mirî be, navê bavê wî (Wê) nedihat lê kirin.. Li gor orf û edatê,navê bapîr an dapîr dihat lê kirin. Ewil navê bavê mêr nedihat danîn. Bi şêwirî navbeyna jin û mêran de hebû. Ev jî dide nîşan kirin ku qedir û qîmet didan ramanê hevdû. Yanî mirov dikare bi kurtasî bibêje ku, mêr ji jinan ne bilintir bûn. Wekî hev bûn. Lewra fikrekî parvekirina jîyanekê di nav wan de hebû.

Di zewacê de jî azadîyek hebû. Bi xwezgîntîyê zewac pir tune bûye. Ev tevger helbet bi salane wê hatîyê guhertin. Em dikarin bibêjin sed sal berê jî ne wisa bûye. Lê ber bi demên niha ve hatîye guhertin. Zewacên bi xwezgîntî bi îslamîyetê ketîye nav gelê Kurdan. Zewaca bi gelek jinan re jî demên berê tune bûye. Heya ku yek ji yekê re nebêje ez ji te êdî hez nakim hevberdan di nav Kurdan de tune bû. Helbet bi îslamîyetê pirzewac êdî ket nav gel. Lê êdî jin ji alîyê mêrê xwe ve nehatiba hêzkirin jî, berdan ji holê rabûbû. Jin, hewce bû ku bi qedera xwe razî bibe. Wisa jî bû jinan êdî dengê xwe bilind nedikir. Heke bilind bikira jî bi dîn (ol) dihate qut kirin. Helbet mêrên Kurdan pir jî van tevgerîya qebûl nekiribûn. Yanî em dikarin bibêjin ev tevger pir nehat qebûl kirin.Hew Reîsê e'şîrêkî, an mirovên dewlemend dikarîbû bi pir jinan re bizewîcîya. Vê jî hêdî hêdî rola jinên Kurd kêm dikir. Jinan bi Îslamîyetê xwe kişand malê. Karên derve mêran dikir, jin li malê bûn hew jin bûn. Êdî hew jina mêrê xwe, dayîka zarokê xwe bû. Rolê wan her ku wê de diçû winda dibû.Lê em ber bi van rojan ve mêze dikin ku jin ji nû ve wê qalikê dişkînin. Dîsa xwe dixwaze bide qebûl kirin, li kolana ye. Di nav civakê de ye. Helbet bi rengekî din. Her çi qas bi her alîyê xwe hebûna xwe nişana her kesî bide jî, rastî ev e ku hebûn ne wek berê ye. Bi xwe ferzkirina dinyaya moder ne. Dem çi qas jî were guhertin, wezîfeyeke her kesî heye. Mêr mer e, jin jî jin e. Lê rastîyekî jiyanê heye ku jîyan bi hevdû re tê jîyîn. Rola jinan her çi qas hatibe guhertin jî, dîsa jin jin e. Li paş mêrê xwe disekine. Belkî ne li meydanê ye , lê rê dide mêrê xwe. Gotinek heye dibê, li pişt her mêrê serfiraz jinikek heye…

# "Dermanên Kurdî û Jin"



Demên berê li gundên Kurdan, heke yek nexweş biketa dibirin cem pîrikan. Li gundên Kurdan, însanên ku li ser nebatan dişixûlin hebûn. Belê li her gundê Kurdan pîrikek hebû û jê re digotin; Pîrik,bijîşk,doxtor an jî otaci…hwd. Wateya van navan hemûyan yek e.

Bi gelemperî ev kar, ji alîyê jinan ve dihate kirin. Ji ber ku di demsalan de li çol, çîya û banîyan, jin cureyên nebatan kom dikirin û bi van nebatan derman çêdikirin. Dermanên ku çêdikirin cuda cuda bûn. Her gîya ji bo nexweşîyeke cuda dibû derman. Pîrikê, nas dikir kîjan gîya ji bo kîjan nexweşîyê baş e. Li gor viya ew gîya dida nexweşan. Pîrik, biharê an jî payîzê gîya kom dikir. Lewra bi gelemperî giyayên ku jê re hewce bûn, di van demsalan de derdiket. Carna nebatên taybet jî havînê an jî zivistanê diçinî, kom dikir û zuwa dikir. Paşê van gîyana muhafaza dikir ku, bila tesîrê xwe winda nekin. Carna kokê gîyayê ,pelê gîyayê û toximê gîyayê hildanî û vana dikirin derman. Giyayên ku dibû derman, carna ji bo birînan,carna jî ji bo nexweşîyan dibû şîfa. Ev gîyana ji alîyê tenduristîyê ve bi sedsalan li gundên nezîkê çîya û banîyan dihate bikaranîn. Em îro jî dinêrin ku, gîya ji bo beşa tibê bûye çavkanîyeke girîng. Helbet li ser van tiştan gelek niqaş tê kirin. Lê rastîyek heye ku, hîn beşa tibê pêş ve neçûbû ,insanên ku li çolan dijîn van gîyana bi kar anîne û pê şîfa dîtine. Helbet wê çaxê belkî bi zanyarî nehatîye bi kar anîn lê bi nerînên xwe û bi ceribandinên xwe fêhm kirine û nas kirine. Em îro dinêrin, insanên ku telesîya xwe ji tibê qut kirîne jî, berê xwe dide beşa nebatan. Dîsa li gor xwe lêkolîn dike, li çareserîya nexweşîya xwe digere. Insanên wisa, tavilê xwe li cem pîrikan dibîne.

Ji dermanên ku pîrik çêdikirin re; digotin "Dermanê Kurdî''. Em dîsa dibînin ku di nav jîyanê de jinên Kurd he ne. Dîsa bi her awayî xwe dide berçavan. Dîsa xwe dide qebûlkirin. Jinên Kurd her tim bi şiklêkî an jî bi rengekî di nav civakê de xwe dida nîşandan. Helbet mêr jî van karên Dermanê Kurdî kirîye. Heta ew bi xwe jî, li çola pezê xwe bi van gîyana daye çêrandinê. Lê wekî jinan nehatîye qebulkirin. Bawerî zêdetir bi jinan hebû. Ji ber ku, jin her tim li banîyan bûye, li çolan xebat kirîye. Jinan; dar, bax û bostan ji nêz ve nas dikir. Berî ku van gîyayan bike derman, ewil ew bi xwe bêhn kirîye, tehm kirîye, tê daye, bi kar anîye. Yanî bi kurtasî ceribandina ewilî li ser xwe kirîye. Bi vê rêya gihiştîye encamê xwe. Bi vî rengî bawerîya insanan pêk hatîye. Helbet li ser dû sê nexweşîyan jî tetbiq kirîye û paşê bawerîya xwe pê anîye . Bi vî şiklî navê xwe daye naskirin. Ev destên bi şîfa, ji gundekî din derbasî gundekî din bûye. Wisa belav bûye. Li alîyê her deveran nexweş hatine cem. Yanî bi kurtasî bûye doxtora wê deverê.

Bi rastî jî em dinêrin ku te'bîat bi laşê însanan re nezîkê hevdû ye. Jixwe nebatên ku li dinyayê, ma ji bo xizmeta insanan nehatine xuluqandin.? Nexwe dîsa her tişt bi hevdû re giredayî ye. Insanên ku li Mezopotamyayê dijîn şîfayê xwe ji tebî'atê dîtine. Bi gelemperî dayîkan, ev xebat ji nifşekê derbasî nifşê din kirine. Bi tebî'etê re jîyane. Dayîk, di nav jîyana xwe de ji tebîetê qet neqetîyaye. Lewra ji cureyên gîya an parcaran xwarin çêkirine. Ev xwarin, xwarine. Carina bê hemd bûye şîfa. Carna jî gîyayê botana şêrîn bûye derman. Ji wezîfeyên Tebîetê yeke din jî ev e ku , insan nêzîkê hevdû kirîye. Hîn li herêmê nan di tenduran de an di malan de, bi alavên malê, yanî bi tebîetê tê çêkirin. Dîsa hemû tişt bi destê jinan dibe

## Vejîna Salvegera Sikretêrên Elpartî (Kemal Derêş – Hemîd Sîno – Deham Mîro) li Hewlêr




Wek wefadariyekî ji têkoşerên Elpartî re, nûnertiya Partiya Dimuqratî Kurdî li Sûrya (Elpartî) li Hewlêrê salvegera her sê sikretêrên Elpartî Kemal Derwêş, Hemîd Sîno, û Deham Mîro bibîr anî. Tê de birûska sikretêrê Elpartî Nesridîn Ibrahîm ji alî endamê lijna herêmî Ebdo Hebeş hate xwendin, dûv re kurtejiyana her sê têkoşeran û gelek helbest hatin xwendin.

## Li Hola Kongiran Li Qamişlo Semînarek ji Birêz Ehmed Silêman Re



Di roja 7 / 11/ 2014an endamê nivîsgeha siyasî di partiya Pêşverû de birêz Ehmed Silêman li hola kongiran li Qamişlo û bi amadebûna hejmarek mezin ji siyasiyan semînarek li ser rewşa siyasî piştî civîna Dihokê û awayên lihevkirina di navbera Encumen Niştimanî Kurdî (ENKS)û Tevgera Civaka Dimuqrat (Tev - Dem) lidar xist.

## Mehrecana Helbesa Kurdî li Qamişlo lidar ket




Di roja 7/11/2014an li hola Melekiyê li Qamişlo Mehrecana Helbesa Kurdî ya nozdemîn û bi amadebûna hejmarek mezin ji nivîskar, rewşenbîr, û helbestvanan lidar ket, di mehrecanê de bêtirî 60 helbestî ji yên kilasîk û nûjen hatin xwendin, û tê de helbestvan Narin Umer bê ku amade bibe hate xelatkirin.

## Şaxê Hesekê yê( Y.N.K.S) ji bo kobanê mangirtinek vekirin



Bi amadebûna Şanda (ENKS) û (PYD) û bi vexwendina Şaxê Hesekê yê Yekîtiya Nivîskarê kurd – Sûriya, mangirtinek aştiyane ji bo roja Kobanî ya gerdûnî li gastîna (Alûçî) hat lidarxistin.

Mangirtiyan tê de gotin: "Ev roj roja pişgiriya Kobanî ye, jiber ku îro roj Kobanî dorpêçkrî ye ji hêla dijminê şaristaniyê" Da'iş" ku ew dixwaze kurdan qir bikin"

Û di dawiya vê mangirtinê de Ibrahîm Xelîl Endamê destey birêvebir a Y.N.K.S, spasiya hemû kes û şandên ku beşdarî vexwendina wan bûn kir.

## Şehîd Mezlûm Bakok Li Navenda Mihemed Şêxo Ya Çand û Hunerê tê Bibîranîn



Di roja 1/11/2014an de li navenda Mihemed Şêxo ya çand û hunerê çilê şehîdê ragihandinê li Rojava Ehmed Se´do (Mezlûm Bakok) û bi amadebûna hejmarek mezin ji cemawer, ragihêner, û hevalên wî lidar ket. Tê de gotina birayê Ehmed, malbatên şehîdan, ragihandina azad, û yekîneyên parastina gel hatin xwendin. Di dawî de bavê şehîd spasiya hemû kesên amade bûn kir, û filmek kin li ser jiyana Ehmed hate weşand.

## Yazdeh Helbestvan Şevbuhêrkekê Ji Bo Kobanî Lidar Dixin



Li navenda Subarto di roja 6 /11/2014an 11 helbestvan civiyan û gelek helbest li ser berxwedana Kobanî xwendin. Helbestvan jî ev bûn: Ismaîl Kûsa, Zeyneb Xoce, Merwan Şêxê, Ciwanê Ebdal, Ciwan Hemê, Şînda Ehmed, Zibêr Mexso, Fayiz Ehmed Ebdo, Elî Ehmed, û Mihemed Bîco bû. Di dawiya şevbuhêrkê de helbestvan Ehmed Heyder gotinek bi navê Yekîtiya Nivîskarên Kurd xwend û tê de spasiya kesên beşdar kir.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpress@gmail.com
00905368908545

bûyer PRESS
Nûçe Bi ... Zelalî



## "Da`iş" li Mûsilê vîrûsa (IBOLA) belav dike

Çekdarên rêxistina radîkal a bi navê Dewleta Îslamî ya Iraq û Şamê (Da'iş), yên ku ji Efrîqayê hatine, vîrûsa IBOLA li nava xelkê Mûsilê belav dikin.
Çavkaniyên pizîşk ji nav Mûsilê ji çend dezgehên medyayê re ragehandin ku, hejmarek ji çekdarên "Da'iş" yên ji welatên Efrîqayê tevlî rêzên wê bûne, helgirê vîrûsa IBOLA ne û ew vîrûs li nava xelkê Mûsilê jî êdî belav dibe.
Li gor çavkaniyên pizîşkî, niha herî kêm 15 çekdarên " Da'iş " hene ku helgirê vîrûsa navborî ne. Lê heta niha tu daxwiyaniyeke fermî ji aliyê Wezareta Tendirûstiyê ya Iraqê ve nehatiye dayîn ku hebûna vê vîrûsê li Mûsilê piştrast bike.
IBOLA, vîrûseke metirsîdar e ku mirov pê dikeve, cara yekem di sala 1976'an de li çend welatekî Efrîqayê derket, bi riya henasêaxaftin tê veguhstin, kesê ku vê vîrûsê jî helgire ku di demek kurt de neyê çareser kirin, canê xwe ji dest dide.

## Wezareta Tenduristiyê derbarê rewşa koçberan de hişyarî da

Rêveberê Giştî yê Karûbarên Tenduristiya Hewlêrê hişiyarî ji xirabiya rewşa derbider û koçberên li Herêma Kurdistanê da û daxwaz ji rêxistinên navdewletî kir ku alîkariya hikûmeta Herêma Kurdistanê di hawarhatina koçberan de bikin.
Dara Xoşnav di daxuyaniyekê de ragihand ku, tevî ku rewşa tenduristî başe û heta niha ti nexweşî û bela belav nebûne, lê rewş metirsîdare ji ber nebûna paqijiyê."
Navborî aşkere kir jî ku, Wezareta Saxlemiyê ya Herêma Kurdistanê hemû pîvan standine bo rêgirtin li belavbûna nexweş û belayan di nava kampan de û got: "Tîmên mezin bo serdana kampên koçberan hatine pêkanîn, ku rojane alîkarî û xizmetguzariyên pêwîst pêşkêş dikin."
Rêveberê Giştî yê Karûbarên Tenduristiya Hewlêrê diyar kir jî ku, li kampên Xanikê, Şariya û Batîlê li parêzgeha Dihokê navendên tenduristiyê 24 demjimêran vekirî ne û kar dikin û desthilatên xwecihî li her parêzgehekê şirketên taybet ên paqijkirinê kirê kirine ji bo paqijkirina kampan.

## Vîza Di Navbera Iraq û Tirkiyeyê De Namîne



Her du welatên Iraq û Tirkiyeyê rêkeftin ku vîzayê di navbera xwe de nehêlin. Medyaya Tirkiyeyê belav kir ku, Wezîrê Derve yê Iraqê Îbrahîm Ceferî û Wezîrê Derve yê Tirkiyeyê Mevlût Çavûşoglu rêkeftin li ser wê yekê ku di dema serdana welatiyên her du welatan de pêwîstî bi vîzayê nebe. Ev pêngav piştî başbûna têkeliyên di navbera Enqere û Bexdayê de tê, ew jî piştî ku Serokwezîrê Iraqê Nûrî Malikî ji desthilat çû û hikûmeta nû ya bi serokatiya Serokwezîrê nû Heyder Ebadî hat avakirin. Tê çaverê kirin ku nemana vîzeyê di navbera Iraq û Tirkiyeyê de, pêwendiyên bazirganî di navbera wan de berv pêşde bibe ku niha rêjeya wê bazirganiyê 12 milyar dolar e.

## Zarokên Mersînê Ji Bo Zarokên Kobanî Lîstok Çêkirin




Li Mersînê zarokên diçin korsa Navenda Jinan IŞTARê ji bo zarokên Kobaniyê lîstok çêkirin. Xwendevanên Navenda Jinan ji bo zarokên hemsaliyên xwe yên ji Kobanî xebitin.
Lîstokên ji aliyê zarokan ve hatin çêkirin dê ji aliyê nûnerên Navenda Jinan ve bigihîn zarokên penaber ên li Pirsûsê.
Perwerdekar Gulbahar Gozel û Munevver Urun ragihandin ku ji bo penaberên hatin Mersînê alîkariyên mirovahî ji ber hev kirine û dane wan.
Perwedekaran diyar kirin da ku ew zarako keyfxweş bibin û zarokên korsan wan jî di mijarên wisa de hestiyar bibin çalakiyek wisa pêk anîne.
IŞTAR, irêdayê Şaredariya Akdenizê ye.
Li Pirsûsê (Suruç) derdorê 200 hezar penaberî Kobaniyê dijîn.

## Kurdî Xweş e



Dûrxistin إبعاد
Palvedan اتكاء
Komelnasî علم اجتماع
Pirotêst احتجاج
Jiberçûn إجهاض
Avfirê نافورة
Bedenkirin هيكلة
Binpêkirin خرق
Bîrûbawerî – pirinsîp مبدأ
Cebilxane عتاد
Sotemenî وقود

## Mamik ???

- Qubba bê kutek?
- Simê gê tije xwê.?
- şiva ter li guher.?
- Xanima ser kursî, dixwe nanê tisî?
- Ezmanê darîn e, berfê dibarîne?

Bersiva hejmara 6an
Kaxez – Tiving – Teyare - Dev û diran - Hejîr

## Ne Her

*Ne her çiya, bi dar û bere .
*Ne her bîr, ava wê tê vexwarin .
*Ne her kesê bi şaşik û cibe şêx e .
*Ne her kes dikare comerdiyê bike .
*Ne her çêlek xweş doşe .
*Ne her tilûr, goştê wî tê xwarin .
*Ne her quba sipî ziyaret e .
*Ne her gul, bîndar e .
*Ne her çile, şilî û barane .
*Ne her zimanê şêrîn, rastgo ye




## Zûbêj



*Tu dikarî sê caran, zû li ser hev bêjî:*
*Ez çûme mala mele remezan, min go:*
*Ka mera mala mele remezan li mal e.*
*Go: mera mala mele remezan li merê ye.*

## XAÇERÊZ

**ASOYÎ:**
1- Ji bo ragihandinê çap dibe.
2- Dîn, çiyayekî bakur.
3- Tayên pîrepîrê (vajî).
4- Wek hev, herêmeke kurdî bi zaraveyê xwe binav dibe.
5- Ken (bê dengdêr), daçek (vajî), mûyên rû.
6- Peyal hûr kir.
7- Tersî ceng (vajî).
8- Peleke bi lez li ser tê nivîsandin duvre tê avêtin.

**STÛNÎ:**
1- Rewşenbîr.
2- Kesê bi olê pabend e, tu (tewandî).
3- wekhev.
4- Welatekî Asyayê (vajî).
5- Deware nêr (vajî), şufêr (vajî).
6- Welatê Firewnan, çemekî li Misrê ye.
7- Paşdaçek (vajî), genimê hêrtî ye.
8- Çînî (belawela), bide min.

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | | | | | ■ |
| 2 | | | ■ | | | | | |
| 3 | | | | | ■ | | ■ | |
| 4 | | | ■ | | | | | |
| 5 | | | ■ | | | ■ | | |
| 6 | | ■ | | | | | | ■ |
| 7 | | | | | ■ | | ■ | |
| 8 | | | | | | | | |

### Hejmara Bûrî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | M | I | Ş | T | E | N | Û | R |
| 2 | Û | J | Ê | M | ■ | A | ■ | ■ |
| 3 | Z | ■ | R | ■ | A | M | E | D |
| 4 | E | W | A | N | ■ | E | R | Ê |
| 5 | X | A | N | I | M | ■ | Ê | R |
| 6 | A | ■ | Î | J | I | B | ■ | I |
| 7 | N | Û | ■ | A | L | ■ | O | K |
| 8 | E | ■ | A | D | A | R | ■ | ■ |